ZIMANÊ KURDÎ

SERETAYÎ

2

Ev pirtûk ji aliyê Qomîteya Ziman û Perwerdê ya KCK'ê û Qomîteya Zanist û Ronakbiriyê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.

AMADEKARÊN PIRTÛKÊ

Qomisyona Ziman ya berê pirtûk amade kirîn

M. Elî Demir, M. Şîrîn Çetin, Mazlûm Tekin, Îsmet Yalvaç, Hewar Gungen, Sedîq Benek, Selamet Erdogan, Emîne Bulut, Hesin Demir, Sofî Sidar, Mihemed Kara

Ji aliyê Qomîteya Ziman û Perwerdeya KCK'ê ve qomîsyonek taybet ji nûnerên parçeyên Kurdistanê, ji bo nûkirin û sererastkirina van pirtûkan hatiye damezrandin.

Qomîsyona nûkirin û sererastkirina pirtûkan

Mizgîn Egîd, Arşek Baravî, Mazlum Tekin, M. Şîrîn Çetin, Birahîm Xelîl, Laleş Ferqînî, Dijwar Botan, Ednan Hesen, Mustafa Osman, Hisên Cızîrî

Redaksiyon

Qomisyona nûkirin û sererastkirina pirtûkan

Bi Alîkariya Bahoz Baran

Wênexêziya hinek wêneyan

Muazzez Filiz
Cengiz Kara

Mîzanpaj, rûpelsazî, sererastkirin û berhevkirina wêneyan

Bedredîn Oy
Merwan Yaman

Çapa pêşîn: 1999
Çapa Nû: 2013

Ev pirtûk; ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve,

weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.

Email: s.m.kurdi2014@gmail.com



“Zimanê me bingehê netewa me pêktîne, divê em biparêzin û pêş bêxin.”

NAVEROK

BEŞA 1 ..... **2**

XWENDEKAR 2
EM BIXWÎNIN, GUHDARÎ BIKIN 2
MIJARA SERBEST 2
PÎVOKÊN ZOZANAN 2
ALFABEYA ZIMANÊ KURDÎ 2
ALFABEYA ZIMANÊ KURDÎ 2
NIVÎN ÇÛ ŞER HEW BÛ 2
AMÛRÊN MIN YÊN WANEYÊ 2
GUHDARÎKIRIN 2
MAMOSTEYÊ HERÎ MEZIN 2
NASANDIN 2
NIVÎSANDINA TÎPÊN BIÇÛK 2
TOPA MIN 2
MIJARA SERBEST 2
DEMSAL 2
XEWA LI BIN KULAVÊ SPÎ 2
DAXWAZA AXAFTINA BI PIRTÛKÊ RE 2
TEST 1 2

BEŞA 2 ..... **2**

SERPÊHATIYA PIRTÛKÊ 2
MELA Û DEH KER 2
MIJARA SERBEST 2
EY FELEK 2
GUR Û ROVÎ 2
HATINA ZIVISTANÊ 2
MORÎ Û ÇIRÇIRK 2
ŞÊR Û MIŞK 2
NAMEYA ÇÎÇEKÊ 2
HÊZ DI YEKÎTIYÊ DE YE 2
LÎZTINA BI BERFÊ 2
TEST 2 2

BEŞA 3 ..... **2**

MAMIK 2
KÎ ME EZ 2
HINDO Û RINDO 2
XAÇEPIRS 1 2
NEXWEŞIYA DAYÎKÊ 2
MIJARA SERBEST 2
8'Ê ADARÊ 2
LAWÊ HIŞMEND 2
NEWROZ 2
ROJBÛNA HERJÎNÊ 2
PÊKENOK 2
CEHŞIK Û MASÎ 2

GURÊ NALBEND 2
TEST 3 2

BEŞA 4 2

KEVOK Û MORÎ 2
RÊHEVAL 2
ADAR E 2
DARA GÊLYAZÊ 2
SÊ PERPEROK 2
AMÛRÊN ME YÊN DIBISTANÊ 2
NÊRÎNA AZAD 2
GOTINÊN PÊŞIYAN 2
DAYÎKA MIN 2
COTKAR Û DAR 2
ZIMANÊ KURDÎ 2
RÛNIŞTINA DI REFÊ DE 2
MAMIK 2
DÛ PÊŞBIRKVAN 2
HEVALÊN MIN 2
TEST 4 2

BEŞA 1

XWENDEKAR

Piştî bêhnvedana havînê; sala me ya xwendinê dest pê kir. Em hatin dibistanê. Me gelek hevalên xwe yên par dîtin.

Mamosta em rêz kirin. Xêr hatina me kir. Paşê em derbasî refê bûn. Karê ku me di bêhnvedana havînê de kiribû, ji me pirsî:

-Niha em diçin refa duyem. Pêwîst e em ji par bêhtir bixebitin. Waneyên me yên îsal berfirehtir û cudatir in. Heke em li ser waneyên xwe baş bixebitin, em ê bi ser bikevin.

Wateyên Peyvan

Wane: Ders
Derbasbûn: Borîn, têperbûn
Xebitîn: Karkirin

Em Têbigihin

1- Xwendekaran li dibistanê kî dîtin?
2- Mamoste ji xwendekaran re çi got?
3- Çima pêwîst e em îsal bêhtir bixebitin?

Destûrên Ziman

Valehiyên hevokên li jêr yên ku ji mijara jor hatine girtin dagirin.

Me gelek hevalên xwe yên ……. dîtin

…….. em ji par bêhtir bixebitin..

Heke em li ser …….. xwe baş bixebitin, em ê ……...

-Hevok bi tîpa mezin destpêdike.

-Xal (.) li dawiya hevokan tê bikaranîn.

-Peyvên li jêr di nava hevokê de bikarbînin.

Xal:…….
Wane:…….
Havîn:……..

Em Bixwînin, Guhdarî Bikin

Mijarê ji mamoste guhdar bikin. Dema hûn guhdar dikin, bila çav û guhên we li mamoste bin.

Bi tiştên wekî pênûs û jêbiran nelîzin.

Dema hûn bêdeng dixwînin, lêvên xwe nelivînin. Di dilê xwe de bixwînin.

Di xwendina bideng de hewl bidin da ku hûn jî weke mamoste bixwînin.



MIJARA SERBEST

Pîvokên Zozanan

Pîvokên li zozanan
Gulên xan û eywanan

Bermayên xaka pîroz
Narîn û şeng û dilsoz

Ji bo me mûm û çira
Hêja ye koçik û sera

Dengê azadiya gelan
Hûn hêviya Ocelan

ALFABEYA ZIMANÊ KURDÎ

Aa Bb Cc Çç Dd

Ee Êê Ff Gg Hh

Ii Îî Jj Kk Ll

Mm Nn Oo Pp Qq

Rr Ss Şş Tt Uu

Ûû Vv Ww Xx Yy Zz

ALFABEYA ZIMANÊ KURDÎ

Tîpên Dengdêr

Aa Ee Êê Ii Îî

Oo Uu Ûû

Tîpên Dengdar

Bb Cc Çç Dd Ff Gg

Hh Jj Kk Ll Mm

Nn Pp Qq Rr Ss Şş

Tt Vv Ww Xx Yy Zz

HÎNDARÎ

Van pendan bixwînin, kite bikin û li lênûsa xwe binivîsin

-Heta kefa dest reş nebe tama dev xweş nabe.

-Nefs hemû kes.

-Bi gulekê gulistan nabe.

HÎNDARÎ

Van pendan bixwînin, kite bikin û li lênûsa xwe binivîsin.

-Kaniya te av jê vexwar, gemar neke.

-Aqil taca zêrîn e, li serê her kesî nîn e.

-Kedkarê xwe be, şîrînê ber dilê hevalê xwe be.

NIVÎN ÇÛ ŞER HEW BÛ

Nîva şevê bû, li ber deriyê Melayê navdar dengê gengeşeyekê dihat. Mela mereq kir. Bêyî ku guh bide jina xwe, ji malê derket. Ji bo ku li ber sermayê nexweş nebe, nivîna xwe avêt ser milê xwe. Dema şerê du kesan dît. Got:

-Hêê! Rawestin. Hûn çima şer dikin?

Di vê demê de yek ji wan rahişt nivîna ser milê mela û revand. Yê din jî li derekê xwe veşart. Mela bi neçarî, diziviriî. Jina mela jê pirsî:

-Êêê... Mela şer çi lê hat?

Mela got:

-Çi nîn, nivîn çû şer hew bû.



Wateyên Peyvan

Gengeşe: Dengê bilind û tevlihev

HÎNDARÎ

Valahiyên li jêr dagirin.

…….şevê bû.

Dema şerê …….. kesan dît.

Em Têbigihin

1- Lehengên pêkenokê kî ne?
2- Armanca mela ya derketina ji der ve çi bû?
3- Kîjan gotinên mela hûn kenandin?

Destûrên Ziman

1- Hevoka li jêr bi awayekî rast li lênûsa xwe binivîsin.

Li ber deriyê melayê navdar dengê gengeşeyek dihat.

2- Di hevoka jêr de peyva çawaniya hewayê dide diyarkirin nîşan bikin.

“Ji bo ku li ber sermayê nexweş nebe, nivîna xwe avêt ser milê xwe.”



Amûrên Min Yên Waneyê

Amûrên her waneyê cuda cuda ne. Navên amûrên li jêr li binê wan binivîsin.



.....

.....

.....



.....

.....

.....



.....



Jimartek.

GUHDARÎKIRIN

Xebat, di refa 2-B yê de dixwend. Rojekê mamosteyê wan nehatibû dibistanê. Mamosteyê hêşedar ew li refan belav kiribûn. Xebat û pênc hevalên xwe jî çûbûn refa 2-A yê. Dema ku mamoste ket hundir, hemû xwendekar rabûn ser xwe û piştî rojbaşê, li ciyê xwe rûniştin.

Waneya wan Zimanê Kurdî bû. Mamoste çi dipirsî xwendekaran destên xwe radikirin û bi destûra mamoste bersiva pirsan didan. Dema ku xwendekarek diaxivî yên din jî hemûyan bêyî ku biaxivin guhdarî dikirin. Kengê axaftina wî/wê dawî lê bihata, xwendekaran dîsa tiliyên xwe ji bo mafê axaftinê radikirin. Xebat û hevalên xwe gelek ji van tevgeran hez kiribûn.

Di refa wan de jî xwendekaran destên xwe radikirin lê carnan hin xwendekar bêyî ku destûrê bixwazin diaxivîn.

Roja din mamosteyê wan hatibû. Xebat, tiştên ku roja berê jiyayî, bi destûra mamoste, bi refê re parve kir û ji hemû hevalên xwe xwest ku êdî ew jî wiha tev bigerin.

Wateyên Peyvan

Hêşedar: Nobedar
Maf: Heq
Destûr: Rêdan

Destûrên Ziman

-Tîpa destpêka navên taybet mezin tê nivîsîn.

-Xêzika axaftinê (-) li destpêka axaftina kesekê/î tê bikaranîn.

-Peyvên li jêr di nava hevokê de bikarbînin.
Xebat:……..

Mamoste: ……..

Xwendekar: ……

MAMOSTEYÊ HERÎ MEZIN

Mamostayê herî mezin.
Raman li min kir serûbin.
Ramanên nû afirandin.
Ji ku ve tê ev bawerî?

Ew bû kaniya zanistê.
Qehremanê çerxa bîstê.
Çiqa bêjî, jê re kêm tê.
Ji ku ve tê ev bawerî?

Dersek mezin dide artêş.
Jê dikişîne kul û êş.
Bi fermanan wan dide pêş.
Ji ku ve tê ev bawerî?

Dengê Penaber

Wateyên Peyvan

Raman: Hizir, fikir,
Afirandin: Dahênandin, peydakirin
Çerx: Sedsal
Zanîst: Ilm, zanîn

Em Têbigihin

1- Me zanebûn ji kê girtiye?
2- Qehremanê çerxa bîstê kî ye?

Destûrên Ziman

1- Hevokên di helbestê de bi tîpên çawa hatine destpêkirin?
2- Navên taybet bi tîpên çawa tên nivîsîn?
3- Valehiya li jêr dagirin.
…… herî mezin.

NASANDIN

Navê min Derya Medî ye. Ez li Qamîşlo ji dayîk bûme. Heşt salî me. Di dibistana Dr. Nurî Dêrsimî, di refa duyem de dixwînim. Navê dayîka min Delal Medî, navê bavê min Zinar Medî ye. Pîşeyê dayîka min mamostatî ye. Bavê min jî karker e. Ez herî zêde ji xwarina kutilkan, ji lîstika destmalê û xwendina pirtûkan hes dikim.

Wateyên Peyvan

Qamîşlo: Navê bajarek Rojavayê Kurdistanê ye.
Pîşe: Karê ku mirov dike û pispor dibe.
Kutilk: Cureyeke ji xwarina Kurdî ye.

Em Têbigihîn

1- Derya çend salî ye?
2- Navê dayîk û bavê wê çi ne?

NIVÎSANDINA TÎPÊN BIÇÛK

Tîpên li jêr bi awayekî rast li lênûsa xwe binivîsin.

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Di nivîsandina her tîpekê de pênûsa xwe bi aliyê rastê ve xwar bikin.

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z



XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1- Helbestê ji mamosteyê xwe guhdarî bikin.
2- Çend caran bêdeng bixwînin.
3- Bi qasî 30 cm'yan pirtûkê ji çavên xwe dûr bigirin û bixwînin.
4- Dema hûn dixwînin û guhdarî dikin rast rûnin.



TOPA MIN

Topa min reng bi rengî
Bi tep û rep û dengî

Dema min diborînî
Xemên min direvînî

Ji lîstina te têr nabim
Bi te re xemgîn nabim

Wextê radibe esman
Şadibim ji dil û can

Bilind dikim dû destan
Da te bigirim bi asan

Dengê Penaber

Wateyên Peyvan

Asan: Hêsan
Xem: Kul û derd
Şabûn: Keyfxweşbûn

Em Têbigihin

1- Çima zarok herdû destên xwe bilind dike?
2- Zarok çima xwedî li topa xwe derdikeve?

Destûrên Ziman

1- Rêzikên li jêr bi awayekî rast li lênûsa xwe binivîsin.

“Dema min diborînî
Xemên min direvînî.”

Tîpên destpêka rêzikan mezin hatine nivîsîn?
Li dawiya van rêzikan kîjan hêma tê bikaranîn?

HÎNDARÎ

1- Navê dibistana xwe bêjin û bi awayekî rast li lênûsa xwe binivîsin.

2- Nav, paşnav, ref û jimara xwe ya dibistanê li lênûsa xwe binivîsin.

3- Nav û paşnavê endamên malbata xwe binivîsin.



Ji bo ku tu bigihî xwarina xwe ya ku jê hes dikî, divê tû di şopa sewalên bi bask de herî.

Gelo Baran ji kîjan xwarinê hes dike?



MIJARA SERBEST

DEMSAL

Sal ji çar demsalan pêk tê. Bihar, Havîn, Payîz û Zivistan.

Di biharê de hewa hûnik dibe. Kulîlk vedibin û xweza ji xewa xwe radibe.

Havîn pir germ e. Mirov cilên tenik û vekirî li xwe dikin.

Di Payîzê de hewa sar dibe, pelên daran zer dibin û diweşin.

Zivistan mizgîniya berfê ji zarokan re tîne. Hewa pir sar dibe û wê demê mirov cilên xwe yên stûr li xwe dikin.



Bihar

Havîn

Payîz



Zivistan

XEWA LI BIN KULAVÊ SPÎ

Rojekê payîz hat û cîhan hênik bû. Hêdî, hêdî ber bi sermayê ve diçû. Daran pelên xwe diweşandin. Ji dayîka mezin xwezayê pirsîn:

-Em gelek westiyane. Ji havînê ve em di kar de ne. Pêwîstiya me bi xewê heye. Em dixwazin demekê razin.

Xwezayê got:

-Bila, xwe amade bikin, ez ê ji we re kulavekî spî rê bikim.



Pelan got:

-Em ê çi bikin?

Xweza dayîk got:

-Hûn bi dilê xwe ne.

Hûn dixwazin bilîzin, dixwazin razin.

Pelan got;

-Baş e. Em ê bêhnekê bilîzin,li dora dayîka xwe kom bibin û piştre razin.

Dar jî ketin xewa zivistanê. Ta biharê di xew de man.

Wateyên Peyvan

Xweza: Sirûşt
Kulav: Amûrek ya ji hirî pêkhatiye.
Kulavê spî: mebesta berfa zivistanê ye

Em Têbigihin

1- Çima daran dixwestin razin?
2- Piştî razana daran çi hat serê pelan?
3- Bûyera di mijarê de, di kîjan demsalê de çêbûye?

HÎNDARÎ

Hezkirina her zarokekî cuda cuda ye û neyek in. Hinek kes ji sewalan, hinek jî ji lîstokê hez dikin. Divê mirov li ber van rewşan rêzdar be.

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Dema hûn bêdeng dixwînin, çavên xwe fêrî xwendina bi lez bikin.
Mijarê bi dengekî xwezayî bixwînin.
Di xwendinê de li van şiyar bin.

- Tilî û pênûsa xwe li ser rêzikan negerînin.
- Serî û destên xwe nelivînin.

DAXWAZA AXAFTINA BI PIRTÛKÊ RE

Dîcleya biçûk sibê zû ji xewê rabû. Pirtûka xwendinê ya birayê xwe Firat bi destê xwe hilgirt û pelên wê wergerandin. Li wêneyên pirtûkê nêrî, xwest bixwîne. Lê nekarî bixwîne. Ew hêj pênc salî bû. Gelek çîrok ji dapîra xwe guhdar kiribûn. Dapîra wê gotibû, ev di pirtûkan de nivîsandî ne. Ji ber wê çendê Dîcleyê got:

- Pirtûka ciwan, pirtûka biçûk, çîroka “Dîk û Rovî” ji min re bibêje. Lê pirtûk bêdeng ma.

Dîcleyê ji dayîka xwe pirsî:

- Dayê, ji bo gotna çîrokan, ez ji pirtûka birayê xwe hêvî dikim. Ew bêdeng dimîne. Gelo ew ji min xeyidiye?

- Na keça min, Pirtûk naxeyîde.

- Wê kengê bi min re baxive?

- Wê niha baxive keça min.

Dayîka wê, pirtûka xwendinê ya Firat ji ser mêzê rakir û dest bi xwendina çiroka “Dîk û Rovî” kir.

Dema Dîcleyê li çîrokê guhdarî dikir di hembêza dayîka xwe de nivist.



Wateyên Peyvan

Dapîr: Dayîka dê û bavê mirov.
Wergerandin: Qulipandin, zivirandin.

Em Têbigihin

1- Dîcleya biçûk dema sibê zû rabû, çi kir?
2- Dîcleyê ji pirtûkê çi hêvî dikir?
3- Pirtûka Firat çawa pê re axivî?

Destûrên Ziman

Tîpên destpêka nav û paşnavan mezin tên nivîsîn.

HÎNDARÎ

Sûdên Pirtûkê, bi hevalên xwe re parve bikin.
Di dema parvekirinê de van destûran li berçavan bigirin.
.Heta hûn mafê axaftinê nestînin, nepeyvin.
.Di refê de, bi dengekî ku hemû hevalên we bibihîzin baxivin.
.Hûn lênûs û pirtûkên xwe berg dikin?
Ji bo di nava lênûsa we de rûpelên vale nemînin, hûn baldarbin?

TEST 1

1- Hêmaya xal li kûderê tê bikaranîn?

a- Li dawiya peyvê.
b- Li dawiya hevoka pirsyarî.
c- Li dawiya hevokê.



2- Çend tîpên zimanê kurdî hene?

a- 30
b- 32
c- 31

3- Jimara tîpên dengdêrên di zimanê Kurdî de çende?

a- neh
b- heşt
c- şeş

4- Tîpa destpêka navên taybet çawa tê nivîsîn?

a- Hinek mezin hinek biçûk.
b- Mezin tê nivîsîn.
c- Biçûk tê nivîsîn.

5- Wateya peyva “Çerx”ê çi ye?

a- Demsal
b- Hezar sal
c- Sedsal

BEŞA 2

SERPÊHATIYA PIRTÛKÊ

Li newaleke kur bûm.
Dareke pir dirêj bûm.
Ser û binê xwe ter bûm.
Bi çiq û pelgên kesk bûm.

Rojekê hat min birek.
Li xakê kirim dîrek.
Winda kir ev şox û şeng
Ez xirkandim bi kotek.

Ketim makînê bi lez.
Ez hûr kirim gez bi gez.
Hin şol çêbûn lez bi lez.
Min dît ez bûme kaxez.

Niha jî pirtûkek xweş.
Zarok bi min dil bi geş.
Min dixwînin çavên reş.
Ji kêfa bûm gula geş.

Dengê Penaber

Wateyên Peyvan

Birek: Amûra qetkirin û birînê.
Xak: Erd, ax
Dîrek: Stûn
Makîne: Dezgeh, Amûra bi mator
Gez bi gez: Qet-qet, parçe-parçe

Em Têbigihin

1- Berî ku dar bê birîn, dareke çawa bû û li kûderê bû?
2- Piştî kîjan karanînan, dar bûye kaxez û pirtûk?
3- Çima zarok dilgeş bûn?

Destûrên Ziman

Sergotara her mijarekê heye.
Sergotara helbesta jor çi ye?
Ji navên yek tiştî tenê didin diyarkirin re **navê yekjimar** tên gotin.
Li ser navê yekjimar pêveka "**an**" û "**ên**" tên pêvekirin û dibin navên pirjimar.
Pirjimarî di nava hevokê de diyar dibe.

Mînak:

Yekjimar	**pirjimar**
Pirtûk	**Tû pirtûkan bîne.**
Birek	**Ew birekan tûj dike.**
Çav	**Ç avên min**

MELA Û DEH KER

Melayê Navdar dema ji rêyeke dûr vedigeriya, westiyabû. Li aşê ku di rêya wî de bû, bêhna xwe vekir. Ber êvarî, dema ku dê biketa rê aşvan wiha gotê:

-Mela, tû mirovekî xêrxwaz î. Li dera hanê deh ker hene. Bi xwe re bibe gund. Tuyê li yekî jî siwar bibî.

Mela jî pejirand. Li yekê siwar bû, yên din jî dan pêşiya xwe û ket ser riya gund. Di rê de cîhan tarî bû. Tirsek ket dilê mela, got:

-Ka ez van keran bijmêrim.

Jimart neh ker bûn.Yek jê kêm bû.

Got:

-Ka ez peya bibim û bijmêrim.

Lê nêrî, deh in!

Dîsa li kerekê siwar bû. Riya xwe berdewam kir.

Gelek di ser re neçû, careke din ker jimartin, neh bûn! Ji kerê ku lê siwarbûyî peya bû û jimart. Deh in. Serê xwe rakir û got:

-Her cara ku ez li kerekê siwar dibim, yek jê kêm dibe. A baş ew e, ji vir û pê de heta gund ez peya biçim ji kêfa bûm gula geş.

Wateyên Peyvan

Aş: Cihê ku dexil lê tê hêran.
Berêvarê: Piştî nîvro, nêzikî êvarê.
Pejirandin: Erêkirin, qebûlkirin.

Em Têbigihin

1- Kesê ku di pêkenokê de dabaşa wî tê kirin kî ye?
2- Kerên Melayê Navdar çend bûn?
3- Di vê pêkenokê de hûn bi kîjan peyv û tevgerên Melayê Navdar kenîn?

Destûrên Ziman

Di sergotara pêkenokê de çend peyv hene? Sergotar bi tîpên çawa hatiye nivîsîn?

HÎNDARÎ

"***Ker***", tebayeke kedî ye.
Ji nav tebayên li jêr tebayên kedî diyar bikin?

hesp	***ga***	***sivorî***
hirç	***bizin***	**Pisîk**

Tebayên kedî ku hûn nas dikin navên wan li lênûsa xwe binivîsin.

MIJARA SERBEST

EY FELEK

Ey felek felek
Ey zalim felek
Kanî Kurdistan
Ka Birca Belek…

Cegerxwîn



GUR Û ROVÎ

Gundiyan bîrek kolabûn. Du dewl li ser girêdabûn. Dema ya tijî bi jor diket, ya vala jî dadiket jêr. Roviyekî tî xwe avêt dewlê û daket binê bîrê. Têr ava hênik vexwar. Dema derketinê rovî behitî.

“Ez daketim lê ez nehizirîm, ka ez ê çawa derkevim.”

Di wê demê de gurekî xwe li ser bîrê xûl kir. Rovî bi kêfxweşî gazî gur kir:

Tû çima radiwestî? Tû jî were vexwe.

- Ez ê bêm lê çawa?
- Ew dewla din jî me ji bo te amade kiriye.

Gur xwe avêt dewla vala û dest bi daketina jêr kir.

Rovî jî, hilkişiya jor. Di nîvê rê de rastî hev hatin.

- Erê tû yê bi ku ve biçî?
- Min ava xwe vexwar. Ez diçim jor.
- Ez ê çawa derkevim?

Rovî got:

- Te tenê daketin ji min pirsîbû! Bi xatirê te.

Wateyên Peyvan

Dewl: Bêrdoş, bêdrok, mencelok, satil.
Rêwî: Kesê ku ji cihekî diçe cihekî dûr.
Behitîn: Şaşmayîn, matmayîn.

Em Têbigihin

1- Rovî, çawa daketibû bîrê?
2- Rovî çima daket bîrê?
3- Rovî, ji bo ku ji bîrê derkeve çawa gur xapand?

Destûrên Ziman

Tîpa destpêka hevokê ya li jêr, çawa hatiye nivîsandin?
- Têr ava hênik vexwar.
Li dawiya hevokê hêmayeke çawa hatiye danîn?

HATINA ZIVISTANÊ

Zarok: Dayîka min tû dikarî goreyek hirî ji min re çêbikî?

Dayîk: Kurê min, dema min hirî peyda kir, ezê ji te re çêbikim.

Zarok: Emê hiriyê ji ku derê peyda bikin?

Dayîk: Ji mihê.

Zarok: Miha delal tû dikarî hin hirî bidî min?

Mih: Hiriya min kurt e. Ji mêrgê re bibêje bila giyê bide min. Ji bo hiriya min dirêj bibe.

Zarok: Mêrga hêşîn, tû dikarî giyê bidî miha delal.

Mêrg: Ez ê bidim lê ji ewran re bibêje, bila baranê bibarînin, ji bo giyayê min bor bibe.

Zarok: Ewrên xweşik hûn dikarin li ser vê mêrga hêşîn baranê bibarînin?

Ewr: Çima nebarînim? Lê ji ba re bibêje, bila min bibe raserî mêrgê.

Zarok: Bayo, giyanê min, tû dikarî vî ewrê xweşik bibî raserî mêrgê.

Ba ewr bir raserî mêrgê. Baran barî. Giya bor bû. Hiriya mihê dirêj bû. Şivan hirî birî. Dayîkê ew şûşt, şeh kir û rist. Ji bo kurê xwe, goreyeke xweşik çêkir.

Ew zivistan pir sar bû lê goreya hirî piyên wî germ kirin.

Wateyên Peyvan

Mêrg: Cihên têr giya yan jî bi çîm, şînatî,
Mih: Pezê spî, mêşin
Bor: Gur bûn û bilind bûna giya

HÎNDARÎ

Zarok, ewr, mêrg, mih û dayîka ku di mijarê de ne, zindî bikin. Pênc kes bi hev re bixwînin.

Em Têbigihin

1- Zarokî ji dayîka xwe çi xwest?
2- Dayîkê, çi bersiv da?
3- Piştre zarok bi rêzê ve bi kîjan heyînan re axivî?

Destûrên Ziman

1- Di hevoka jêr de hêmaya pirsê hatiye bikaranîn.
*Miha delal, tû dikarî hinek hirî bidî min**?***

2- Peyvên li jêr bi awayekî rast li lênûsa xwe binivîsin.

"baran ba ewr"

RASTNIVÎSA TÎPÊN BIÇÛK Û MEZIN

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M
N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z

a b c ç d e ê f g h i î j k l m
n o p q r s ş t u û v w x y z

Tîpên li jêr bi destnivîsê li lênûsa xwe binivîsin!

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L
M N O P Q R S Ş T U Û V W
X Y Z

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q
r s ş t u û v w x y z

MORÎ Û ÇIRÇIRK

Hebû çirçirka havînê
Şev û roj dilîlînê
Ji xwe re nake xebatê
Lê dide keçkê dînê

Moriya reş cîrana wê
Tim guh dide dengê wê
Şev û rojan kar dike
Daxwaz nake weke wê

Borîn tev ew rojên xweş
Şûna wan hat çilê reş
Li çirçir çêbû ser êş
Morî di kunê de kêfxweş

Carekê hate bîrê
Bezî derê hêlînê
Ji cîranî dixwaze
Xwarinek ya havînê

Morî rabû ser piya
Got were şêra çiya
Xwarin ji te re nîne
Tû bêje serêliya…

Wateyên Peyvan

Serêlî: Awazek ê stranê
Çirçirk: Kêzika havînê

ŞÊR Û MIŞK

Rojekê şêrek li binê siya darekê razayîbû. Di wê demê de, mişkek ji binê axê derket û ket nava pencên şêr. Mişk, pir tirsiya ku şêr wî bixwe. Lê mezinê daristanê, li xwe negirt ku xwe tevlî mişk bike. Ji ber mezinahiya xwe mişk nexwar.

Mişk got:

-Bawer neke ku ev qenciya te wê vale biçe.

Şêr, rojekê ji daristanê derket û ket davê. Ne xwevekutan ne jî nirîna wî, bandor li ser davê nekir. Mişkê birêz, bezî û bi diranên xwe dav kot. Dav qetiya û şêr jî azad bû.

Gotina mişk hat bîra wî û wiha got:

-Karê ku qencî dike, ne hêz û ne jî dijwarî dikare bike.

.

Wateyên Peyvan

Nirîn: Dengê ji şêr derdikeve.
Kot: Birîn, kurisandin
Dav: Xefik, feq
Daristan: Cihê ku dar lê pir in.

Em Têbigihin

1- Bûyera di vê mijarê de çêbûyî di navbera kê de bû?
2- Van herdu teba birêzê ve çi bûyer jiyan kirine?
3- Em dikarin çi encamê ji vê mijarê derxin?

HÎNDARÎ

1- Ji derdora xwe çîrokekê guhdarî bikin û binivîsîn.
2- Bûyerên ku di çîroka we guhdar û temaşekirî

Destûrên Ziman

1- Peyvên li jêr di nava hevokê de bi karbînin.

teba - şêr - mişk

2- Valehiya di hevoka jêr de dagirin

……. neke ku ew qenciya te wê vala biçe.

Destnivîs

Vê hevoka li jêr penc caran binivîsin.

"Yê qenciyê bike, dê qenciyê bibîne."

NAMEYA ÇÎÇEKÊ

Hevala hêja Zozan;

Ew nameya ku we ji bo min rêkirî, min girt. Ez gelek pê dilşa bûm. Dayîk û bavê min jî, gelek pê kêfxweş bûn.

Heke tu pirsa dibistana min ya nû dikî, ez ê ji bo te vebêjim. Em jî wek we di dibistanan de zimanê xwe dixwînin. Ez ji heval û mamosteyên xwe gelek hes dikim. Min pir bêriya we û Mexmûrê kiriye. Ez li Kobanê refa duwem di dibistana seretayî ya Ş. Osman de dixwînim.

Bi hêviya ku careke din em hevdu bibînin.

Silav û Rêz

Çîçek Firat

Wateyên Peyvan

Koban: Bajarek yê Rojavayê Kurdistanê ye.
Dilşa: Şabûna dil, dilxweşî.

Em Têbigihin

1- Çîçek li kûderê dixwîne?
2- Bajarê Kobanê dikeve kîjan parçeyê Kurdistanê?

Destûrên Ziman

1- Hevokên li jêr li lênûsa xwe binivîsin. Di dawiya hevokên li jêr de hêmayeke ya hevokê bi kar bînin.

Dayîk û bavê min jî gelek pê kêfxweş bûn.

Ez gelek pê dilşa bûm.

2- Peyvên li jêr di nava hevokekê de bi kar bînin. Wan hevokan li lênûsa xwe binivîsin.

Name ***Çîçek*** ***Zozan*** ***Mamoste***

HÎNDARÎ

Ji hevaleke xwe re nameyekê binivîsin. Li dawiya nameya xwe nav û paşnavê xwe binivîsin.

Nameya xwe bixin zerfekê, li ser zerfê navnîşana xwe û ya hevala xwe binivîsin.

HINÊR: Hevala Çiçek Firat
Rojavayê Kurdistanê Kobanê
Taxa Ş. Serhat Dibistana Ş. Osman Kobanê/ROJAVA

Birêz Zozan BOTAN
Semta 2 Taxa 3
Wargeha Ş. Rustem Cudî
MEXMÛR /HEWLÊR
BAŞÛRÊ KURDISTANÊ

Rastnivîsandina bi dest û girêdana wan bi hev re.

Kurdistan welatê me ye.
Berxwedan jiyan e!
Çiçek û Zozan hevalên hev in.

HÊZ DI YEKÎTIYÊ DE YE

Çend zarokên cotkarekî hebûn. Zarokên wî, li hev nedikirin. Cotkar ji wan re digot:

- Ji hev hez bikin, alîkariya hev bikin.

Lê zarokan guh nedidan van amojgarî.

Rojekê cotkar gazî zarokên xwe dike û ji wan re dibêje:

- Ka deh şivikan bînin.

Zarokan, deh şivik anîn. Dan bavê xwe. Cotkar ev şivik bi hev ve girêdan. Yek bi yek da destê wan û got: - De ka bişkînin.

Zarokan hewl dan ku vê desteya şivikan bişkînin. Lê nekarî bişkînin. Cotkar desteya şivikan vekir. Şivik yek bi yek da zarokên xwe. Vê carê zarokan bi hêsanî şivik şikandin. Li ser vê yekê, cotkar ji zarokên xwe re wiha got:

- Vaye hûn dibînin, ên ku dibin yek, bi hêz dibin. Hûn ê bi kitekit zû bikevin. Heke hûn bibin yek, hûnê bêhtir serfiraz bibin.

Wateyên Peyvan

Şivik: Darikên zirav û dirêj.
Deste: Qevdik, gurzik, baq.
Hewldan: Kar, xebat û tevger.

Em Têbigihin

1- Bûyer di navbera kê de derbas dibe?
2- Cotkar, dixwest zarokên wî li hember hev çawa bin?
3- Cotkar, çawa zarokên xwe ezmûn kirin?
4- Bûverê zindî bikin?

Destûrên Ziman

Li hevoka jêr binêrin, bixwînin, fêr bibin ka bêhnok li kûderê tê danîn. Hevokê li lênûsa xwe binivîsin.



Cotkarî got: Ji hev hez bikin alîkariya hev bikin.

LÎZTINA BI BERFÊ

Ji êvarê de berf barîbû. Xanî di bin berfê de mabûn. Derdor bi rengê spî xemilîbû. Zarokên gund, dema ji xew rabûn, dîtin ku hemû derdor bi berfê spî bûye. Tev derketin kolanan. Li kêleka malan, bûka berfê çêkirin. Kumek danîn ser serê wê. Piştre ew dan ber gulatên berfê.

Azad gazî hevalên xwe yên xwe li ser berfê dixişikandin kir:

-Sîpan! Xişînekê baş bigire, tû yê bikevî.

Bêrîvanê fanêreyê xwe yê hirî li xwe kir û çû nav hevalên xwe. Bi hev re mîna birûskan ji jor dadiketin jêr.

Bi qêrîn û ken ji xwe re dilîstin.

Wateyên Peyvan

Gulat: Guloka berfê.

Xişînek: Amûra ku ji bo xişikandina li ser berfê tê bikaranîn, xizak, qule

Em Têbigihin

1- Bi hatina zivistanê re guhertinên li derdora me çêdibin çi ne?

2- Bêrîvanê çima fanêreyê hirî li xwe kiribû?

3- Zarokan ew roj çawa derbaskirin?

4- Azad çima gazî hevalê xwe kir?

Destûrên Ziman

Pêwîst e em di hevokên jêr de, di navbera kîjan peyvan de bêhnokê bikar bînin?

Zarokên gund dema ji xew rabûn dîtin ku hemû derdor bi berfê spî bûye.

Sîpan! Xişînekê baş bigire tû yê bikevî.

HÎNDARÎ

Lîstika xwe ya roja berfê, bi çend hevokan bidin nasandin.

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Ji mînakên jêr sûdê bigirin, li ser nivîsîna spehî bixebitin.

DARISTAN JÊDERA DEWLEMENDIYA WELAT E!

DEMSALA BIHARÊ VEJÎNA XWEZAYÊ YE.

TEST 2

1- Ji navên yek tiştî tenê tînin ziman re çi tê gotin?

a- Navên heyberî
b- Navên yekjimar
c- Navên pirjimar



2- Ji tebayên li jêr kîjan ne kedî ye?

a- mirîşk
b- şêr
c- se

3- Helbesta "Ey Felek" berhemê kê ye?

a- Cegerxwîn
b- Melayê Cizirî
c- Ehmedê Xanî

4- Kîjan navên li jêr di mijara "Em Bi Berfê Bilîzin" de derbas dibin?

a- Sorgul, Aras, Aram
b- Azad, Sîpan, Bêrîvan
c- Şêrwan, Kewê, Mazlûm

5- Bajarê Kobanê dikeve kîjan aliyê Kurdistanê?

a- Rojavayê Kurdistanê.
b- Bakûrê Kurdistanê.
c- Rojhilatê Kurdistanê.

BEŞA 3

MAMIK

Şikeftek tarî tejî mirarî. (Dev û diran)

Di deryayê de melevaniyê dike lê ne masî ye. (Keştî)

Dimeşe bê ling e, digirî bê çav e. (Ewr)

Hespê şê bazda hewşê. (Şirik)

Bidirav kes nakire, tû dixwazî nawere. (Amojgarî)

HÎNDARÎ

Hûn jî li malê çend mamikan peyda bikin û li lênûsa xwe binivîsin.

KÎ ME EZ



Dizivirim dem û gav
Ranawestim ji bizav

Ne nan dixwim ne jî av
Nîn e gore û pêlav

Çik çik ji min tê her dem
Diyar dikim kat û dem

Westan ji min re nîne
Ew karekî şermî ne

Şev û rojê hişyar im
Ji we tevan re yar im

Vê şîreta pir girîng
Guhdarî bike ey rêvîng

Xebat û her tim xebat
Bes ew e rêya felat

Eger te got navê min
Xelat bigire ji xweyê min

Cegerxwîn

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Yek ji we bibin Hindo, yek ji bibin Rindo. Nivisandinê weke hûn li hemberi hev baxivin, bixwînin.

HINDO Û RINDO

HINDO

RINDO

***Rindo*:** Roj baş!

***Hindo*:** Roj baş Rindo.

***Rindo*:** Tu çawa yî, baş î?

***Hindo*:** Baş im, sax bî Rindo.

***Rindo*:** Tu bi ku ve diçî? Diçî aş?

***Hindo*:** Naçim aş? Diçim dibistanê.

***Rindo*:** Ka lê binêre! Ma piştî vî temenî kes diçe dibistanê?

***Hindo*:** Çima naçin? Ez ê bixwînim û fêr bibim.

***Rindo*:** Here! Here! Bixwîne, da tu jî fêr bibî!

***Hindo*:** Ma temen ji fêrbûnê re heye?

***Rindo*:** Di vê demê de zarok diçin dibistanê. Tu mirovekî mezin î, weke zarokan diçî dibistanê.

***Hindo*:** Na Rindo na. Viyan li dibistanê ye. Niha wê ji waneyê derkeve û ez ê bibim malê.

***Rindo*:** Ka te digot temenê çûyîna dibistanê nîne?

***Hindo*:** Jixwe nîn e. Lê ez bi şev fêrî zimanê xwe dibim.

Wateyên Peyvan

Temen: Jî

Em Têbigihin

1- Dema Hindo û Rindo rastî hev tên, çawa silav didin hev?

2- Hindo, ji ber çi diçû dibistanê?

3- Hindo ji bo çûyîna dibistanê, çi bersiv da Rindo?

HINDARÎ

Nivîsîna li jêr bi awayekî rast û xweşik li lênûsa xwe binivîsin

Adar xemla Biharê ye.
Xemla çiya, dewlemandiya welat e
Çiyayê Agirî bilindtirîn çiyayê Kurdistanê ye.

Destûrên Ziman

1- Navên di mijarê de Rindo, Hindo û Viyan her yek ji wan navên taybet in.

Ew di nava hevokê de bi tîpên çawa hatine nivîsandin?

2- Li dawiya hevokên li jêr, hêmaya pêwîst bi kar bînin.

Tu çawa yî, baş î

Tu bi ku ve diçî

Ez naçim aş, diçim dibistanê

.

XAÇEPIRS 1

Navên navdarên li jêr di xaçepirsê de bibînin.

Goran

Aram

Gerabêt

Tîrêj

Cegerxwîn

Hejar

s	q	u	a	h	u	w	o	p	a
e	a	s	e	m	h	q	s	t	g
l	a	r	a	m	e	w	ş	î	b
v	i	j	ê	t	j	f	i	e	s
s	a	o	a	y	a	n	m	ê	x
g	o	r	a	n	r	a	w	j	c
w	x	j	c	v	r	q	s	a	e
d	ê	g	e	r	a	p	ê	t	g
î	s	x	a	ê	i	z	q	n	d
c	e	g	e	r	x	w	î	n	f

NEXWEŞIYA DAYÎKÊ

Roza, weke her dem zû diraza. Li ser nivîna xwe demekê xilmaş bibû. Ji nişka ve dengek bihîst. Roza bezî oda dayîka xwe. Dayîka wê dinaliya. Roza:

- Yadê yadê!

Dayîka wê bersiv neda. Xwest ku wê bi maçîkirinê ji xewê rake. Dayîka wê ta girtibû. Bi lez û bez, agahî da xwişka xwe Hêlînê. Piştre çû destmal şil kir, anî û danî ser serê dayîka xwe. Dayîka Rozayê piçekî çavên xwe vekirin. Sê caran li ser hev got:

- Ax! Axx! Axx!

Wê demê Hêlîn hat. Pileya germbûna dayîka xwe pîva. Pileya germbûna wê gelek bilind bû. Telefon da bijîşk. Bijîşk hat. Lê nêrî, derziyek lêda û çû. Roza:

- Dayîka min, tu baş bûyî?

Dayîk:

- Ez baş bûm giyana min.

Hêlîn:

- Heke di destpêkê de Rozayê destmal şil nekiribûya û ne danîba ser serê te, wê êşa te girantir bibûya.

Wateyên Peyvan

Bijîşk: Dixtor, hekîm
Pile: Ast, derece
Giyan: Can, rih

Em Têbigihin

1- Roza çawa têgihişt ku dayîka wê nexweş e?
2- Çima destmala şil danî ser serê dayîka xwe?
3- Hêlînê ji bo saxbûna dayîka xwe çi kir?

Destûrên Ziman

1- Valehiyên li jêr dagirin.
Dayîka .....nexweş ket.
Bi lez …bez, agahî da xwişka xwe Hêlînê.
Roza bezî oda dayîka …….
2- Van kiteyên li jêr bikin hevok.
Di-wê-de-mê-de-Hê-lîn-hat.

HÎNDARÎ

Ji bo em nexweş nebin, pêwist e em çi bikin? Li ser vê mijarê çend hevokan binivîsin.

Dema hûn dinivîsin vê rêbazê bişopînin.

Hizrên xwe bêjin .

Hevokên xwe bibijêrin û li ser texte binivîsin.

Nivîsandina xwe bixwînin. Ger hebin, şaşiyên xwe rast bikin.

Sergotarekî li gorî nivîsandinê bibînin.

MIJARA SERBEST

8’Ê ADARÊ

8’ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê ye. Jinên Kurd jî vê rojê weke cejin pîroz dikin. Di vê rojê de jin û dayîk cilên xwe yên netewî li xwe dikin û ji bo pîrozbahiyê dadikevin qadan. Li qadan girîngiya vê rojê tê vegotin.

Ji bo gihandina mafê xwe bi çalakiyên cûr bi cûr wê roja taybet pêşwazî dikin.



HÎNBÛN

Navê jinên navdar yên Kurd di xaçepirsê de bibînin.

Zarîfe

Leyla Qasim

Şîlan

Bêrîtan

ş	î	l	a	n	i	g	b
a	e	e	h	e	d	e	ê
r	o	y	a	n	ê	r	r
î	a	a	î	r	d	a	î
f	p	q	h	b	l	b	t
e	î	a	ê	j	c	ê	a
î	r	s	z	r	o	t	n
n	î	i	o	a	y	û	n
a	r	m	m	b	n	n	n

LAWÊ HIŞMEND

Sê zarokên mirovekî dewlemend hebûn. Rojekê zarokên xwe kom kirin û got:

-Zarokno, êdî ez pîr bûme. Beriya mirina xwe dixwazim heyîn û malê xwe bidim we. Di hundirê sê salan de ji kiryarên kîjan ji we hes bikim, ez ê malê xwe bidim wî.

Zarokan destê bavê xwe maç kirin û bi riyên cûda ve çûn.

Piştî sê salan her sê bira vegeriyan. Birayê mezin got:

- Bavo! Min çil pehlewan anîn. Malê tu bidî min, dê ew pehlewan biparêzin.

Birayê Navîn got:

- Min jî çil hêştir anîn. Ez ê van bifiroşim û dewlemendtir bibim.



Birayê biçûk got:

-Min jî çil zarokên sêwî anîne. Tu malê xwe bidî kê wê ev zarok bibin yên wî. Wê wan zarokan mezin bike û pêş bixe. Ji bo welat wê bibin mirovên bisûd.

Bav:

-Bijî! Min ji kiryara te gelek hez kir.Heyîn û malê min yên te ne

Wateyên Peyvan

Heyîn: Mal û mulk
Dewlemend: Yên xwedî mal
Sêwî: Zarokên bê dê û bav
Hêştir: Dindil, lawirek yê baran
Sûd: Hode, feyde
Kiryar: Kirina kar û xebatê

Em Têbigihin

1- Di vegera xwe de, zarokan çi bi xwe re anîne?
2- Bav, herî zêde ji kiryara kîjan kurê xwe hes kir?

Destûrên Ziman

1- Peyvên li jêr rast bixwînin û binivîsin.
"Bijî, zarok, sêwî"
2- "*Sê zarokên mirovê dewlemend hebûn.*" Vê hevokê kite bikin û li lênûsa xwe binivîsin.

HÎNDARÎ

Pirtûkek ya çîrokan ku we di pirtûkxaneya dibistanê de xwendî, ji hevalên xwe re vebêjin.

NEWROZ

Newroz, cejna gelê Kurd e. Di 21'ê Adarê de gelê Kurd Newrozê pîroz dikin.

Gelê Kurd Newrozê wek cejna rizgariya netewî digire dest û pîroz dikin. Newroz li hember zilmê serhildan e. Ji ber vê yekê êvara Newrozê agirê serhildanê tê geşkirin û roja Newrozê jin û mêr, keç û xortên Kurdan derdikevin qadan. Di roja Newrozê de zarok, cilên xwe yên herî xweşik li xwe dikin. Dayîk, xwe bi cilên kesk, sor û zer mîna kulîlkên biharê dixemilînin. Bav, şal û şapikên xwe yên herî nû li xwe dikin.

Piştre agir vêdixin û derdora agir govendê digirin. Jin û mêr, pîr û kal, zarok û mezin hemû cejna hevdu bi şahî pîroz dikin.

Her kes hatina Newrozê bi kêfxweşî pêşwazî dike.

Wateyên Peyvan

Newroz: Roja nû
Geşkirin: Gurkirin
Pêşwazî: Pêrginî, Çûna pêşiyê

Em Têbigihin

1- Newroz kîjan rojê tê pîrozkirin?
2- Roja Newrozê zarok çi dikin?
3- Roja Newrozê dayîk û bav kîjan cilan li xwe dikin?

HÎNDARÎ

1- Tû dîxwazî di Newrozê de çi bîkî?
2- Amadekariyên Newrozê çawa tên kirin?

ROJBÛNA HERJÎNÊ

Herjîn di 12’ê Sibatê de, wê bikeve 8 saliya xwe. Dixwest rojbûna xwe li malê bi hevalên xwe re pîroz bike. Gelek kêfa dayîk û bavê wê ji bo vê yekê dihat.

Dibistan di bêhndana nîvsalê de bû. Ji ber vê yekê derfet nebûn ku hemû hevalên xwe bibîne. Di pêşî de navnîşana hevalên xwe girtibû.

Hîn pênc roj ji rojabûna wê re mayî, Herjînê vexwendname ya li jêr ji bo hevalên xwe nivîsî.

Hevalên hêja;

Ez ê bextewar bim ku rojbûna xwe bi we re pîroz bikim. Di roja 12’ê Sibatê, demjimêr 12:00’an de, li mala me, ez li benda we me.

Bi heskirinên germ.

Herjîn Amedî

Wateyên Peyvan

Derfet: Delîve, fersend, keys
Navnîşan: Adres, Nav û nîşanê cihekê
Bextewar: Kêfxweş, dilşa

Em Têbigihin

1- Herjînê ji ber çi hevalên xwe vexwend malê?
2- Herjînê di vexwendnameya ku ji bo hevalên xwe nivîsî de çi diyar kiribû?

Destûrên Ziman

Peyvên li jêr di hevokan de bi kar bînin.
"navnîşan, vexwendname"

HÎNDARÎ

1- Kajîn, tev li rojbûna Herjînê nebûbû. Ji ber wê pîrozqerta li jêr nivîsîbû.

Hevala hêja Herjîn;

Ez rojbûna te pîroz dikim. Rojên xweş û geş ji te re hêvî dikim.

Silav

Kajîn Aştî

Hûn jî, ji bo hevalên xwe pîrozqertekê binivîsin û sala wê ya nû pîroz bikin.

PÊKENOK

Di pey A’yê re kîjan tîp tê?

Li dibistanê mamoste ji Lezgîn dipirse:

- Lezgîn tu tîpên alfebeyê hemûyan dizanî?

- Belê mamoste ez dizanim.

- De ka bibêje, li pey tîpa A’yê kîjan tîp tê?

- Li pey tîpa A’yê hemû tîp tên.

CEHŞIK Û MASÎ

Li gundekî cehşikek hebû. Rojekê li peravê Gola Wanê masiyekî dibîne. Di demeke kin de, dibin hevalên hev.

Masî, ji cehşik re dibêje:

- Birayê cehşik, cihê hûn lê dijîn, ez dixwazim bibînim.

Cehşik:

- Fermo em bi hev re biçin.

Herdu bi hev re ketin rê. Ji avê sêçar gavan dûr dikevin. Masî diqîre:

-Hewar!.. Bêhna min çikiya.

Cehşikê bi simê xwe masî avêt nav avê. Bêhna masî fireh bû.

Vê carê cehşik xwest biçe mala masî. Rojekê herdu bi hev re ji bo çûyîna mala masî xwe berdidin nava golê. Dema ku avê da ser bejna cehşikê ve wî jî kire hewar!..

-Ez xeniqîm!

Masî, ber bi peravê golê ve avjenî kir. Li cehşik zivirî û got:

Birayê cehşik min bişopîne.

Cehşik masî şopand û ji xeniqînê rizgar bû.

Ya baş ew e ku herkes li warê xwe bijî. Ji wê rojê û şûn de.

Masî, ji bo cehşik cîhana binavî dida nasîn, cehşik jî ji bo masî cîhana bejahî dida nasîn.

GURÊ NALBEND

Rojekê hespek di nava mêrgekê de ji xwe re diçêriya. Gurek dît û veciniqî. Gur:

- Ez nalbend im, hespan nal dikim.

Hespî li niyaza gurê xirab nêrî û got:

- Fermo mam gur, were simên min nal bike.

Gur hat, xwe nêzîkî hespî kir û devê xwe avêt simên hespî. Lê belê hesp ji wî zîrektir bû. Bi hêza xwe pehîn, li dev û lêvên gur da. Tevayî diranên wî hûrhûrî bûn. Heya demekê hişê wî hat serî. Piştî vê bûyerê gur bazda. Li xwe nêrî û got:

Ma bavê te nalbend bû, bapîrê te nalbend bû. De bixwe! Bila ev rewşa te be!



Wateyên Peyvan

Nalbend: Kesên ku hesp û hêstiran nal dikin.
Bûyer: Rûdan, qewîmîn
Niyaz: Mebest, niyet, Daxwaza di dil de

Em Têbigihin

1- Bûyer di navbera kîjan lawiran de derbas bûye?

a) rovî û hesp
b) gur û ker
c) gur û hesp

2 - Hespî ji gur re çi got?

a) Fermo were min bixwe.
b) Fermo mam gur were simên min nal bike.
c) Mam gur tû fêlbaz î.

3-Di dawiyê de çi hat serê gur?

a) Diranên wî hûrhûrî bûn.
b) Gur bi saxî bazda.
c) Gur û hesp bûn hevalên hev.

TEST 3

1- “Zozan hêj neçûbû dibistanê.” Ev hevok ji çend peyvan pêk hatiye?

a- 3
b- 4
c- 5

2- Di her kiteyek ya peyva “azadî” de çend tîpên dengdêr hene?

a- yek
b- dû
c- sê

3- Nivîsandina kîjan peyvên li jêr rast e?

a- pênnûs
b- jîbir
c- pirtûk

4- Peyva ‘pênûs’ çend kite ye?

a- dû
b- sê
c- yek

5- Di dawiya kîjan hevoka li jêr de hêmaya xal tê bikaranîn?

a- Li çiyê berf barî
b- Newroz cejnek çawa ye
c- Gelo bihar destpêka jiyanê ye

BEŞA 4

KEVOK Û MORÎ

Morî, ji bo vexwarina avê, çû ser golê. Lingê wê şemitî. Moriyê xwe di nava avê de dît. Bi qêrîn û hewar, alîkarî xwest. Di wê demê de kevokek di ser wê re difiriya. Ji xwe re got:

"Ka ez alîkariyê bidim vê belengazê, da rizgar bibe." Qirşikek berda nava avê. Moriyê xwe bi qirşikê girt û derket.

Morî:

- Wey tû sax bî xwişka kevok. Ez ê vê qenciya te ji bîr nekim.

Kevok kenî û got:

- Tû yê çi qenciyê li min bikî!

Çend roj şûnde, nêçîrvanekî bi tifinga xwe nîşan li kevokê girt.

Di wê kêliyê de, çavê moriyê li nêçîrvan ket. Bi lez xwe gihand nêçîrvan. Gezek li gûzeka wî da. Nêçîrvan li ser êşa gûzeka xwe veciniqî û nîşana xwe şaş kir. Kevokê jî ev rewş dît, firiya û bi vî awayî rizgar bû.

Wateyên Peyvan

Veciniqî: Hilbeyî, hilpekî, bizdiya

Em Têbigihin

1- Giyandarên di çîrokê de cih digirin kîjan in?
2- Kevokê çawa morî rizgar kir?
3- Moriyê çawa qenciya kevokê ji bîr nekir?

HÎNDARÎ

1- Li beramberî qenciya kevokê, *moriyê çi kir?*
2- Hûn jî metelokekê ji bo hevalên xwe bêjin.

Destûrên Ziman

1- Di mijarê de, destpêka hevokan bi tîpa mezin hatiye destpêkirin an na?

2- Hevokên di mijarê de, dawiya wan bi hêmaya xal (.) yan jî cotxal (:) hatîne nivîsandin, çendekan li lênûsa xwe binivîsin

RÊHEVAL

Rojekê, Mêrxas dixwaze ji bajarê Amûdê biçe Qamişloyê. Rêhevalê wî pîremêrek bû. Her kesî ji wî pîremêrî re digot Bapîr.

Bapîr, di tirompêlê de, ‘Rojnameya Ronahî’ ji berîka xwe derxist.

Got:

-Tu dixwazî bixwînî Mêrxas?

Mêrxas:

-Naxwazim. Tu bixwîne.

Bapîr:

-Ez xwendinê nizanim.

Mêrxas:

-Lê tu çima rojnameyan dikirî?

Bapîr:

-Ez her tim dikirim. Lê yekî din ji min re dixwîne.

Mêrxas, ‘Rojnameya Ronahî’ girt, rûpelên wê zivirand û got:

-Niha tû dixwazî ez jî ji te re bixwînim?

Bapîr:

-Wey tû gelek bijî! Lê hêdî bixwîne.

Mêrxas, dest bi xwendina rojnameyê kir. Bapîr gelek şad bû. Her dû rêheval ne zanîn ku bi çi awayî gihîştin Qamişloyê.

Wateyên Peyvan

Rêheval: Hevalê rê
Tirampêl: Otomobîl, maşîn, temafîl

Em Têbigihin

1-Axaftin di navbera kê de derbas dibe?
2-Çima, Bapîr rojname nedixwend?
3-Bapîr û Mêrxas ji ku diçûn ku derê?

Destûrên Ziman

1- Di mijarê de, destpêka hevokan bi tîpa mezin Hevokek ya ji mijarê hatî girtin bi awayek tevlihev hatiye nivîsîn. Peyvên vê hevokê bi awayeke rast rêz bikin û li lênûsa xwe binivîsin.

Amûdê Mêrxas dixwaze Rojekê, ji bajarê biçe Qamişloyê.

HÎNDARÎ

Hûn danûstandina di navbera Bapîr û Mêrxas de çawa dibînin?

Hûn jî rêwîtiyeke xwe bi bîr bînin û binivîsin.

ADAR E

Adar e xweş adar e
Dem dema kêf û kar e
Tu bi xêr hatî adarê
Digel bûka biharê
Serma revî çû nema
Hat çaxê geşt û sema
Hate va sersala me
Şahî xiste mala me

Newroz e xweş Newroz e
Cejna me ya pîroz e
Awazên eşqa kevnar
Dagirtin dol û zinar
Welato em bi gorî
Cejna me hat û borî
Hat û borî dê êtin
Me Newroza xwet vêtin

SÊ PERPEROK

Di mêrgekê de sê perperok dijiyan. Yek spî, yek sor û yek jî zer bû. Bi şahî ji kulilkekê difiriyan ser yeke din.

Ji nişka ve dengek ji asîman hat. Ewr li hev civiyan û baranê dest pê kir. Her sê perperok, firiyan û çûn cem şilêrê, jê re gotin:

- Şilêra rindik, tû dikarî me ji şilbûnê biparêzî?

Şilêrê:

- Ez ê perperokên sor û zer, ji baranê biparêzim; lê ez perperoka spî naparêzim.

Perperokên sor û zer gotin:

- Ger tû xwişka me ya spî jî neparêzî, em jî nayên cem te. Her sê perperok çûn hêvî ji nêrgizê kirin.

Nêrgiz:

- Ez ê perperoka spî ji şilbûna baranê biparêzim; lê ez perperokên sor û zer naparêzim.

Perperoka spî got:

- Ger tû her dû xwişkên min ji baranê neparêzî, ez jî nayêm cem te. Her sê perperok bi hev re firiyan.

Rojê, hevalbendiya ji dil û can ya her sê perperokan dît. Bi germahiya xwe baran da rawestandin, ewr belav kir. Her der bi tîrêjên xwe germ û ronahî kir. Perperokan per û baskên xwe zuha kirin.

Her sê dostên dilsoz, bi hev re di nava şahiyê de dîlan kirin û ji nû ve firîn.

AMÛRÊN ME YÊN DIBISTANÊ

Amûrên me yên dibistanê, alîkarên me yên herî girîng in. Pêwîst e ku em li wan amûran xwedî derkevin. Yên xwedî lê dernekevin jî divê em wan hişyar bikin.

Ji wêneyên jêrê kîjan amûrên me yên dibistanê ne? Wan reng bikin.

NÊRÎNA AZAD

Di dibistanên me de, amadekariyên mihrîcana 4’ê Nîsanê dihatin kirin. Mijara ku li ser dihat axaftin, rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdulah OCALAN bû.

Mamoste di waneyê de wiha dipeyvî:

- Rêber APO, ji bo me hemûyan, hizir û nêrînên azad afirandine…

Xwendekar bi baldarî li mamoste guhdar dikin.

Ji xwendekaran Siyabend, dema zivirî malê, gotinên mamoste yên di hişê wî de mayî, bi malbata xwe re parve kir.

Dayîka wî got:

-Belê lawê min, Rêber APO kesayetiyekî pir bi rûmet e.

Wateyên Peyvan

Afirandine: xuliqandine
Hizir: Raman
Parvekir: lêkvekir- parkir

Em Têbigihin

1- Mamoste di waneyê de, di derbarê Rêber APO de çi digot?
2- Siyabend bi malbata xwe re çi parve kir?
3- Dayîka Siyabend, jêre çi got?

Destûrên Ziman

1- "*APO, azadî, dibistan*" Her peyvek ji van di nava hevokekî de bi karbînin.
2- *"Em hemû bi awayekî azad bihizirin."* Di vê hevokê de "**em**" cînav e. Cînav cihê nav digire û rola nav dilîze.
3- *"Siyabend, dibistan, mihrîcan"* Ji van navan kîjan taybet e?

GOTINÊN PÊŞIYAN

Peza ji kerî diqete, para gur e.

“Ev pend; tê wateya kesê ji gelê xwe veqete, wê rastî gelek zorî û nexweşiyan bê.”

Her giya li ser koka xwe şîn dibe.

“Ev pend; tê wateya ku her civak li ser çand û dîroka xwe pêşve diçe.”

Şêr şêr e çi jin e çi mêr e.

“Ev pend; tê wateya wekheviya mirovan.”

DAYÎKA MIN

Ey dayîka şîrîn û rind û delal
Te ez mezin kirim bi şîrê zelal
Tu her roj min amade dikî li mal
Ji bo pêşxistinê, bûyî pişt û pal

Ey dayîka xoştiviya dilovan
Min dixemilînî bi cil û bergan
Bi ramûsan min dişînî dibistan
Da nebim paşketî, paşverû nezan

Da ez zana bibim xwidanê rûmet
Ciwanek pêşketî bi hêz û serwext
Wekî bab û kalan nemînim bindest
Ez dixwazim bibim azad û serbest

Wateyên Peyvan

Xoştivî: Hêja, ezîz, delal
Paşverû: Paşmayî, paşketî
Ramûsan: Maçkirin

Em Têbigihin

1- Zarok, kîjan taybetiyên dayîka xwe tîne Ziman?
2- Pêşxistin û xwedîkirin, di kîjan malikê de diyar dibe?
3- Dayîk zarokên xwe çawa dişîne dibistanê?

Destûrên Ziman

Hevokên jêr li lênûsa xwe binivîsin. Li dawiya hevokan hêmayên pêwîst bi cih bikin.

"Bi ramûsan min dişîne dibistan"

" Ez dixwazim bibim azad û serbest"

HÎNDARÎ

1- Helbestê ji dayîka xwe re bixwîne.

2-Di derbarê "Roja Dayîkan" de, bernameyekî televizyonê temaşe bikin.

COTKAR Û DAR

Carek ji caran; di zeviya cotkarekî de dareke mezin hebû. Ti caran fêkî nedigirt. Tenê sîbera wê hebû.

Cotkar, wê çi ji darek wiha bêber bike? Ji ber siya pelên wê ti şînahî li binê darê şîn nedibû. Cotkar dest avêt bivirê xwe, heya jê hat li qurmê darê xist.

Di wê demê de, beytik û çirçirk bi ziman bûn:

- Cotkar, em hêvî dikin ku tû vê darê nebirî! Ev dar stargeha me ye. Em li ser demek xweş diborînin.

Cotkar, li wan guhdarî nekir. Bivirê xwe rakir û li pey hev li qurmê darê xist. Kunek mezin li darê vekir. Ji darê şilxek mêşên hingivî derket.

Cotkar, piçek hingivî tam kir. Hingiv jî çi hingiv bû! Bivir ji destê xwe avêt.

Ji wê rojê û pê ve, cotkar êdî weke çavên xwe li darê dinêrî.

Gelo hûn dizanin hinek mirov, mafê heyînan li ber çavan nagirin û hertim li berjewendiyên xwe digerin.

Wateyên Peyvan

Sîber: Sî, sih
Şilx: Şilih, Koma mêşên hingivî yên nû.
Berjewendî: Sûdperestî

Em Têbigihin

1- Çima cotkar dara di nava zeviya xwe de dibirî?
2- Çima beytik û çirçirk nedixwestin dar bê birîn?
3- Çi bû sedem ku, cotkar dest ji birîna darê berda?

Destûrên Ziman

Peyvên li jêr li gorî rêza tîpan rêz bikin.
"bivir, dar, em, zevî, cotkar, mêş, hingiv"

HÎNDARÎ

1- Encama we ji mijarê girtî li lênûsa xwe binivîsin.
2- Çîrokek we ji derdorê xwe guhdarî kirî ji bo hevalên xwe bêjin.

ZIMANÊ KURDÎ

Bi xeml û rewş e,
Şîrîn û xweş e,
Şîrîn û xweş e,
Zimanê Kurdî.

Bi xweş awaz e,
Letîf û naz e,
Letîf û naz e,
Zimanê Kurdî.

Beyta Feqî ye,
Kubra Xanî ye,
Kubra Xanî ye,
Zimanê Kurdî.

Bi xeml û rewş e,
Şîrîn û xweş e,
Şîrîn û xweş e,
Zimanê Kurdî.

Qewqeb çiyan e,
Kubra Teyran e,
Kubra Teyran e,
Zimanê Kurdî.

Şikoyê Hesen

Rûniştina Di Refê de

Ez li pişt Robar rûdinim.

Ez li rastê Rengîn rûdinim.

Ez li çepê Xezalê rûdinim.

Ez li pêşiya Egîd rûdinim.



MAMIK

Spî ye ne şekir e, li hewayê difire ne balafir e. (berf)

Simê gayekî, qasî bajarekî. (morîstan)

Dar e ne dar e, giyaxwere ne dewar e. (kîso)

Qesra spî ye, bê derî ye. (hêk)

Ez çûm nizarekî, hemû bûkên salekê. (pîvok)

Hespê boz meydan kir toz. (aş)

Sermişar e, pêxepare, bêhişo dîk e paş de çîk e?

DÛ PÊŞBIRKVAN

Rojekê kêvroşk û kîso ketin pêşbirka bezê .

Pêşbirkê dest pê kir.

Kêvroşk, bi lez çû pêş û ji ber çavan winda bû. Kîso jî, bi rêveçûyîna xwe ya em pê dizanîn, kete rê.

Kêvroşk piştî ku qederekê rê derbas kir,hizirî û got: "Çawa be ez ê ser bikevim" li binê darekî dest bi xewê kir.

Kîso bi hemû hêza xwe dibeziya. Bi lez di ber kêvroşka razayî re derbas bû. Dema kêvroşk ji xewê şiyar bû, riya kîso li ber qedandinê bû.

Kêvroşk:

Çawa be ez ê bigihim wî.

Ji nû ve bezî. Kîso, bi çepikên lawiran beza xwe qedandîbû. Kîso bi hewldan û baweriya xwe xelata pêşbirkê stand.

Lê kêvroşk ji ber ku pir ji xwe bawer bû, xwe sistkir û pêşbirk winda kir.



Wateyên Peyvan

Pêşbirk: Hevrikî, berebezî
Pesin: Xwe mezinkirin, zirt.
Xelat: Perû, diyarî

Em Têbigihin

1- Pêşbirka kîso û kêvroşkê çawa berdewam kir?
2- Çima kêvroşkê pêşbirk winda kir?

Destûrên Ziman

1- Peyva ‘kîso’ û ‘kêvroşk’ di nav hevokê de bi kar bînin.

2- *“Kîso bi hemû hêza xwe ve dibeziya.”* Di vê hevokê de peyva **‘dibeziya’** kar dide diyarkirin.

HÎNDARÎ

Lawirên ku hûn nas dikin di refê de bi çar-pênc hevokan şîrove bikin.

HEVALÊN MIN

Di van wêneyan de hûn tev li kîjan hestî dibin?

Ez tiştên xwe bi hevalên xwe re parve dikim.

Ez xwarinên xwe bi hevalên xwe re parve dikim.

Ez alîkariya hevalên xwe dikim.

Ez kêmasiyên hevalên xwe xweş dibînim û ji bo çareserkirinê dibim alîkar.

TEST 4

1- Tîpên li jêr ên hatine rêzkirin kîjan tenê yên dengdêr in?

a- a-e-ê-i-î-o-u-û

b- a-b-c-ç-d-e-ê-f

c- e-ê-a-i-î-o-û-c



2- Di nav kîjan hevoka jêr de navê pirjimar heye?

a- Ez ji dibistanê hez dikim.

b- Min ji hevalên xwe re got.

c- Dilvîn xwendekareke jîr e.

3- Kîjan navê li jêr navê zindiyan e?

a- ber

b- mêş

c- pênûs

4- Kîso çawa da pêşiya kêvroşkê?

a- Kêvroşkê rêya xwe şaş kir.

b- Kêvroşk di rê de raza.

c- Lingên kêvroşkê têşiya.

5- Moriyê çawa kevok ji mirinê rizgar kir?

a- Banî kevokê kir.

b- Hêvî ji nêçîrvan kir ku wê nekuje.

c- Gezek gozeka nêçîrvan da.

Derya Res
Gurcistan
Rusya
Ermenistan
Azerbeycan
Tirkiye
Nahcevan
KURDISTAN
Iran
Suriye
Derya Sipi
Lubnan
Iraq
Idir
Qers
Sewas
Erzincan
Erzerom
Agri
Bazid
Mako
Caldiran
Dersim
Cewlik
Eleziz
Mus
Tetwan
Behdinan
Wan
Qotur
Xoy
Farqin
Bitlis
Elbistan
Meleti
Fırat
Semsur
AMED
Batman
Sert
Basqale
Gever
Meras
Besni
Siverek
Mardin
Sirnex
Clemerg
Zaxo
Urmiye
Veransehir
Nisebin
Cizr
Entap
Riha
Qamislo
Dicle
Dihok
Nexede
Iskenderun
Hasakeh
Musil
Mihabad
Hewler
Bokan
Seqiz
Bicar
Kerkuk
Silemani
Merivan
Sine
Helebce
Qesri-Sirin
Kirmansah
Xaniqen
Ilam